

70 SAL KURDÎ/KURMANCÎ CEMÎLA CASIMÊ CELÎL



SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Ji bo 70 Saliya Cemîla Casimê Celîl

Ne şaş bim sala 2003 bû. Ji Stenbolê hatibûm Erîvanê û li wir ligel seredan û mêvandariya gelek dost û malbatên hêja, li mala Cemîla Casimê Celîl ya li kuçeya “Tpagirîçnêr” (bi rûsî, Paçatnîkov) numareya 3 qesidibûm. Meta Cemîleyê, ligel dayîka xwe Xanimê, kurê xwe Rustem û bûka xwe li malê bû. Bi rastî jî pêrgî

mêvanperweriyeke germ hatibûm. Dayîka wê xanimê nexweş bû, wekî dayîkeke kezêbşewat a dilrehm hay ji dayîka xwe dima, li ber nexweşiya wê wekî surhekê zexim sekinîbû. Bi ser de jî, xebatên xwe yên yên ku di wan salan de çap bibûn, bi dilgermî û coşeke mezin anî nîşanî min da. Wê rojê pir kêfa min hatibû. Ez bawer dikim, Apê Keremê Seyad ligel min bû. Min jê daxwaz kiribû ku ligel çend sazî, mal û dezgehan, min bibe mala Cemîla Celîl jî...

Cemîla Casimê Celîl ku di nava kurdan de awazsaz, kompozîtor û muzîkzaneka navdar e, di 19'ê Sibata 2010'ê de, dibe 70 salî. Pîroz û Bimbarek be!..

50 salên têrtije di nava muzîk, berhevkarî û zargotina kurdî de...

Ne hêsan e, keçeke kurd, hê di 21 saliya xwe de, bikeve rojname û kovarên Ermenîstanê û Yekîtiya Sovyetê. Li Wiyanayê, li Pirtûkxaneya Casimê Celîl –ku ev der şayanê nivîsandina taybet e û divê her kurdek were vî cihê ‘pîroz’ ê kurdewar bibîne- kovareke ku di serdema Yekîtiya Sovyetê de derdiket, yekser bala min dikişîne, navê wê kovarê; ‘Sovjetsky Soyuz’ ango Soviet Union’ e ku kurdiya wê ‘Yekîtiya Sovyetê’ ye û bi gelek zimanan derdiket.

Di rûpela 32'yan a hejmara 141'ê ya Sovjetsky Soyuz ku di sala 1961'ê hatiye weşandin de, ligel wêneyeke rengîn a Cemîla Celîl, bi cilûbergên kurdewarî û devliken, wiha hatiye nivîsandin: “*Di fotoyê de keçiyeke bi cilûbergên neteweyî yên kurdî. Ew xwendekara Lîseyê ya li Erîvanê Cemîla Celîl e. Cemîla Celîl, yek ji wan kurdan e ku li seranserê Yekîtiya Sovyetê bi dehezaran têne hesabandin. Ew netew, di dema Qeyseriya Rûsyayê de, wekî neteweyeke koçber a bindest dihate zanîn. Lê şoreşê ji wan re, her wekî tevahiya neteweyên li Sovyetê; azadî, û wekheviyê anî. Xeyala Cemîleyê ew e ku xwe pêşkêşî lêkolîna li ser berhevkarîya muzîka kurdî bike...*”

Sê sal paşê ango di sala 1964'an de, di heman rojnameyê, hejmara 167'an, rûpelên 22-23'yan de, heft wêne hene ku tevahiya wan wênayan ligel kurtenivîsaran li ser kurdan in. Nivîsar çavkaniya xwe ji nûçe û agahiyên Rojnameya Riya Teze werdigire ku li Erîvana Ermenîstanê bi zimanê kurdî, lê bi tîpên kîrîlî derdiket. Sernavê nivîsarê ev e: "Razkazyvayet Riya Teze", bi kurdiya wê "Riya Teze dibêje." Wêne û kurtenivîsar li ser fizîknasê kurd Feyzoyê Egîd, Deşt û çandiniya kurdan, Folklornas Ordîxanê Celîl, Serokê Beşê ji Wezaretê Malhebûna Gundîtiyê li Ermenîstanê Semend Siyabendov, Sîma Semend diya du zarokan û Redaktora Radyoya Ermenîstanê ya Axaftinên Zimanê kurdî, zarokên kurd li ber televizyonê ku tê de Şakirê Xido li ser siyaseta derve diaxive.

Herçî Cemîla Celîl e, di heman nûçeyê de, tevî wêneyê xwe wiha hatiye destnîşankirin: *"Cemîla Celîl xwe pêşkêşî muzîka kurdan kiriye. Berhevoka wê ya ku ligel notayan, ji 60 stranên kurdî pêk tê, hêjayî nixandina germ a kompozîtor Aram Xaçaturyan bûye..."*

Belê berhema ku behsa wê tê kirin, beriya niha bi 46 salan, ango di sala 1964'an de, gava ku Cemîla hê 24 salî bûye, bi navê; "Kilamêd Cimeta Kurdan", li Erîvanê ronahiyê dibîne. Divê bidim zanîn; di kovarê de hatiye gotin ku Aram Xaçaturyan nixandineke baş li ser berhevoka ji 60 stranî pêk tê kiriye. Lê çend meh paşê kitêb bi 75 stran/kilaman hatiye çapkirin. Wisa diyar e ku Xaçaturyan, beriya kitêb çap bibe, nixandina xwe li ser destxet ango teksta Cemîla Celîl kiriye.

Divê bê gotin ku Cemîla Celîl, di pêşeka vê kitêbê de wiha nivîsiye: *"Ez vê kitêbê pêşkêşî şehîdên kurdan ên wetenperwer dikim, yên ku emrê xwe dane bo azaya Kurdîstanê..."*

Piştî wê berhemê, Cemîla Celîl bêrawestan û bi eşqeke mezin li ser muzîk, stran, meqamên kurdî kar dike, ked dide û heta sala 2001'ê berhemên bi navê; Kilamên Cimeta Kurda, Moskova, 1965; Kilam û Miqamêd Cimeta Kurda, Moskova, 1973; Stranên Cimeta Kurda, Erîvan, 1977; Kilam û Miqamêd Cimeta Kurda, Stockholm, 1982; Kilam û Miqamêd Cimeta Kurda, Moskova, 1985; Goraniyê Milliyekanî Kurdî, Hewlêr, 1988; Stran û Dîlanên Kurdî, Benda 1. Erîvan, 2001; Stran û Awazên Kurdî, Benda 2. Erîvan, 2002; Goranî Millî Kurdî, Silêmanî, 2004; Stran û Awazên Kurdî, Benda 3. Hewreman, Erîvan, 2006; Stranên Kurdî yên Gelerî, Para 1. Bona Koma Sazbenda, Erîvan, 2001; Stranên Kurdî yên Gelêrî, Para 2. Bona Koma Sazbenda, Erîvan, 2001.

Şayanê gotinê ye ku Cemîla Celîl, ji van berhemên hêja duduyan ango "Stran û Dîlanên Kurdî, Benda 1. Erîvan, bi tîpên latînî, 2001" û "Stran û Awazên Kurdî, Benda 2. Erîvan, bi tîpên latînî, 2002" tevî keça xwe Naza Celîl amade kiriye û pêşkêşî pirtûkxaneyê muzîka kurdî kiriye.

Bi giştî 13 berhemên giranbiha û hêja, kedeke bêhempa dike ku navê Cemîla Casimê Celîl, tevî endamên din ên malbatê derbasî dîroka zêrîn a edebiyat, dîrok û çanda kurdî/kurmançî bibe.

Cemîla Celîl, di sala 1940'î de, li Erîvana Paytexta Ermenîstanê, wekî zaroka sêyem a malbatê çavên xwe ji jiyane re vedike. Bavê wê Casimê Celîlê Osê û diya wê Xanima Rizgo ye. Malbatên Casimê Celîl û Xanima Rizgo, ji gundê Qizilquleya Dîgora Qersê ne. Gava ku binemal, êl û eşîrên kurdên êzîdî, di sala 1918'an de, ji ber karesat û fermana li serê wan rakirin, berê xwe dan 'aliyê din ê Arasê', -hema bêje- tevahiya kesên ji her du malbatan, di şert û şîrûtên dijwar ên koça 'xayîn û bêbext' de jiyana xwe ji dest didin. Karesat û bobelateke wisa ye ku dîtin û veşartina miriyan bixwe jî, hesretek e. Di gotûbêjeke ku çend sal berê min pê re kiribû de, Dîrokzan û Lêkolîner Celîlê Celîl, li ser wan rojan wiha digot:



“...Dema derbasî aliyê din ê Arasê bûne, gelek winda bûne, nexweş ketine, mirine. Trajediyeke mezin e. Ligel ku gelek kes derbasî Ermenîstanê bûne jî, dîsa ji kuştinê rizgar nebûne. Kazim Karabekir Paşa, ji piştê Gumriyê ve çeper li gelê wê derê digire. Çemekî biçûk hebûye li wir. Tê gotin ku ji ber kesên xwe ji ser pirê avêtine avê û qetlîameke mezin pêk hatiye, ‘xwînê laş bi xwe re birine!..’ Qetlîama êzidiyan wê zêdetir bûya. Lê zavayekî kurdên êzîdî, ku jina wî êzîdî bûye femandarekî

osmaniyan bûye. Navê wî Evdîlmeçîd Beg bûye. Dema dibihîze ku derdor kurd in, nahêle ku qetlîam zêdetir bibe. Gelek kesan ji mirinê xelas dike lê mixabin ku dereng hatiye... Dê û bavê diya min li wê derê qetil dikin. Hê zarok e, sêwî dimîne. Mamê bavê min Tajdîn, ji hêla leşkerên osmanî ve dîl tê girtin. Bavê wî, yanî bapîrê min li pey şopa wî dikeve, diçe lê ew jî venagere. Diya bavê min nedihat bîra bavê min. Feqîrê hatibû serjêkirin. Meta min Xecê xelas dibe lê ji ber ku zarok in, rojek destên hev berdidin ew jî winda dibe...”

(Dema ku behsa vê bûyerê dikir, çavên wî şil bibûn, kurtedemek sekinîbû, paşê berdewam kiribû).

(...) Heta mirinê jî ew keser ji dilê bavê min derneket. Ji malbata diya min û bavê min 70-80 kesan jiyana xwe ji dest daye di karesatê de. Nexasim ji malbata diya min tu kes nemaye. Serpêhatiyêke kezêbşewat bibêjim ji te re; meta bavê min, bavê min xelas dike. Gava av radibe, kur û qîzeke wê hebûye. Destê qîza xwe berdide, bi destê kurê birayê xwe digire û her du kuran derbas dike...”

‘Cemîla tu diya min î, lê Zînê xwişka min e!..’

“Ji malbata diya min û bavê min 70-80 kesan jiyana xwe ji dest daye di karesatê de. Nexasim ji malbata diya min tu kes nemaye.” Çiqas zehmet e ne wisa? Lewma ye ku Lehenga vê nivîsarê Cemîla Casimê Celîl, li ser diya xwe wiha dibêje:

“Em şeş kes bûn. Dê, bav, Ordîxanê Bira, Celîlê Bira, Ez û Zîna Xwişk. Ji her du aliyên dê û bavê min, tu kesê me tunebû. Ne mam, ne xaltî, ne met, ne kalik, ne pîrik. Diya min ji birayê min ê mezin Ordîxan re digot; ‘Tu bavê min î’, ji Celîlê bira re digot; ‘Tu birayê min î’, ji min re digot; ‘Cemîle tu diya min î, lê Zînê xwişka min e!..”

Cemîla Celîl, di navbera salên 1948-1958’an de, xwendina xwe ya destpêkê dike û derbasî Dibistana Taybet a Muzîkê ku navê wê Alexander Spendyaryan e. Li vê dibistanê fêrî nota û lêxistina piyanoyê dibe. Piştî ku dibistana deh salan diqedîne, di sala 1959’an de, dibistana heşt salan ya muzîkê jî diqedîne û di sala 1960’î de, dibe xwendekara muzîkê ya bi navê Romanos Melîkyan a çar salan. Di sala 1964’an de Cemîle vê dibistanê diqedîne û diçe nehiyeya Talînê ku 12 gundên kurdan lê hebûn. Li navenda Talînê bi qasî salekê mamostetiya muzîkê dike. Li gorî agahiyên hêja Ordîxanê Celîl, kurdên li Talînê û dorhêla wê zarokên xwe bi dilgermî dişînin ber destê Cemîlayê ku dersa muzîkê bibînin.

Cemîla Celîl di navbera salên 1960-1967’an de, li dibistana Maksîm Gorkî mamostetiya dersa muzîkê dike. Ligel karê mamostetiyê, xwendina xwe ya li ser muzîkê berdewam dike û di sala 1964’an de, dibe xwendekara Konserwatuara Erîvanê ya bi navê Komîtas û li Fakulteya Teoriya Muzîkê heta sala 1969’an dixwîne.

Di Radyoya Erîvanê Beşê Kurdî de xebata 35 salan

Şayanê pesindan û gotinê ye ku Cemîla Celîl, bênavber 35 salan li Radyoya Erîvanê Beşê Kurdî, xebata li ser stran, kilam, nota û awazên kurdî berdewam dike. Di sala 1967’an dest bi karê radyoyê dike, heta sala 2002’yan dibe deng û awazeke rengîn di nav civaka kurdewar de. Cemîla Celîl, tevî rehmetiyê bavê xwe Casimê Celîl 1700 stran, kilam û awazên kurdî –çi evînî, çi govendî, çi mêranî, çi şînî- berhev kiriye û pêşkêşî fondazêrîn a Radyoya Erîvanê kiriye. Divê bê gotin ku bavê wê rehmetiyê Casimê Celîl, wekî nivîsarvan, kedkar, rêveber bi giştî 9 salan di heman radyoyê de kar kiriye. Ji 1700 stran û kilamê behsa wan tê kirin, 1000’ê wê ji hêla Cemîla Celîl ve hatine berhevkirin û amadekirin. Şêwaza xebata Cemîleyê wiha ye: Pêşî stranên kurdî li ser piyanoyê lê dide, paşê ew stran dike nota.

Cemîla Celîl Endama Yekîtiya Muzîkarên Sovyetê, Endama yekîtiya Muzîkarên Ermenistanê, Endama Yekîtiya Rojnamegerên Sovyetê û Endama Yekîtiya Rojnamegerên Ermenistanê ye.

Dema ku min li navenda Pirtûkxaneya Casimê Celîl ya di bin banê Enstîtuya Kurdzaniyê ku li Wiyanyê ye, ji Celîlê Celîl xwest ew behsa xebata xwişka xwe Cemîlayê bike wiha got:

“Bi qasî 50 salan ku Cemîla Celîl li gundê kurdan geriyaye, stran û awazên kurdan berhev kiriye û kiriye nota. Di fonda muzîkê ya malbata Casimê Celîl de ku bi tevgera tevahiya endamên malbatê hatiye avakirin, ji deh hezarî zêdetir stran û awaz hatine civandin û têne parastin. Gundekî kurdan li Ermenistanê nemaye ku Cemîla Celîl neçûye û stranên kurdî ji dengbêjan nenivîsandiye. Di sala 1988’an de min tevî Cemîlayê, rêwîtiyeke zanyarî ji bo sê mehan li Suriyeyê kir. Geryana me li nava kurdên Helebê, Çiyayê Kurmênc, Qamîşlo, Dêrikê, Eyn-Erebê û li deverên din pêk hat û me li dora 1000 stran û awazên hêja civandin. Pareke ji berhevoka vê civandinê, di pirtûkeke taybet de hatiye çapkirin.”

Cemîla Celîl, di serî de Yekîtiya Sovyetê, li welatên Îngilîstan, Başûrê Kurdistanê, Austurya, Fînlandiya, Suriye, Holanda, Polonya, Lîtwanya û deverên din beşdarî konferans û sempozyûmên mezin bûye û bi axaftinên zanyariyê awaz, folklor û muzîka kurdî bilind nixxandiye.

Kerem bikin em careke din guh bidin nixxandinên Celîlê Celîl yên li ser Xwişka wê Cemîleyê:

“Xîreta Cemîleyê, wekî xîreta bavê min bû. Nexwest ku ew dewlemendiya mezin, xezîneya kal û bavan winda bibe. Bibe yê xelkê. Her cara dilê wê diêşiya, gava ku stran û awazên kurdî di radyo û televizyonan de, di birc û serayên xelkê de, wekî muzîka gelên cînar dihate binavkirin. Cemîleyê, stranên gelê xwe baş nas kir. Dît ku cînar ji me didizin, talan dikin, dikin milkê çanda xwe. Ji ber vê jî, dilê wê yê nazik diêşiya, birîndar û kovan dibû. Cemîla Celîl, çentê mezin tevî makîna dengnivîsar û qeydkirinê, defter û qelemên xwe digirte destê xwe û gund bi gund, zozan bi zozan digeriya. Giraniya çentê, riya xerabe yên gundan Cemîleya nazik, aciz nedikirin û nediwestandin. Ji ber ku wê baş dizanibû ku divê ew kar bê kirin, lewre sibe êdî dereng e. Cemîleyê li hêviya kesî nedima. Zivistan bûya, payîz bûya, havîn bûya, ne xema wê bû. Herdem di nava gelê xwe de bû. Tevahiya dengbêjan Cemîleyê nas dikirin. Wê wekî xwişka xwe qebûl dikirin. Di ber xizmeta wê de bûn. Distiriyan, stran û awaz li ber destê Cemîleyê dibûn nota, herf-notayên reş û spî ser pelê kaxezan hev digirtin, dibûn pirtûk. Pirtûkek, dudu, sisê, çar, pênc...”

Pîrozbahiya 60 Saliya Cemîla Celîl, 19 Sibata 2000

60 saliya Cemîla Celîl, di 19’ê Sibata 2000’î de, bi daxuyaniyeke gelek girîng ku li ser navê sazî û dezgeheke mezin û bi îmzeyên navên gelek navdar hate pîrozkirin. Yekîtiya Kompozîtorên Ermenistanê, di nameya ji bo pîrozkirina 60 saliya Cemîla Celîl de wiha gotiye:

“Cemîla Casimê Celîl a Giranbiha;

Rêveberiya Yekîtiya Kompozîtorên Ermenistanê, tevî kompozîtor û muzîkzanên li Ermenistanê, ji kûrahiya dil 60 saliya te pîroz dike. Di warê pêşvexistin û afirîneriya kurdî de ku te jiyana xwe bexşî berhevkirin û folklorê kurdî kiriye de, xizmeta te nayê qiyaskirin. Di çapemeniyê de, xwedana meqaleyên pîrhêjmar, li nêvwelat û li derveyî

welat, tevî stranên gelêrî ku çap bûne. Di vê roja şahî de, tevî tendirustî û bextewariyê, em ji te re serkeftin û afirandinên nû dixwazin.

Îmze: Mîrzoyan, Çavuşyan, Harutsunyan, Hovhannesyanyan, Orbelyan, Têrteryan, Arîstakesyanyan, Amîrxanyan, Godakyan.”

Şayanê gotinê ye ku tevahiya van navan, li seranserê Ermenîstan û Yekîtiya Sovyetê elît û giregirên muzîkê bûn.

Keça Cemîla Celîl, Naza Celîl a 38 salî ku daye ser şopa dayîka xwe û niha li Wiyanayê, li Zanîngeha Muzîk û Hunerê, li ser ‘Dawet, govend, muzîk û erf û adetên kurdî’ doktoraya xwe dike, bi van gotinan behsa tesîra ku dayîka wê li ser kiriye, dike:

“Ji ber ku ez di mala kalikê xwe de mezin bûm, tesîra kalikê min pir li ser min hebû. Paşê dayîka min tesîr li min kir. Em biçûk bûn û serê sibê zû, bi fiqa kalikê min şiyar dibûn. Melodiyên kalikê min, pir xweş bûn. Nexasim melodiya ‘lûr de lûr’ û hinek melodiyên din, dilê me geş dikirin. Tim di mala me de gotin li ser neteweperwerî, folklor û muzîkê bû. Kalikê min ne muzîkvan bû, lê pir baş lê dixist. Guhên min her li ser dengên kasetan bû. Dayîka min herdem ez bi xwe re dibirim gundên Talînê, Elegezê, Eçmiadzînê, Masîsê, Oktobiryanê û Artaşatê. Di nava vê rewşê de ez fêr bûm, pêre jî mezin bûm. Hezkirina min a muzîkê bi vî awayî destpê kir. Ez qet aciz nedibûm, wexta bi dayîka xwe re digeriyam. Ji ber ku dengê govendê, muzîkê û awaza kurdî dilê min geş dikir. Ev xebata ku dayîka min kir, hişt ku ez tevî xwendina xwe ya giştî li dibistana Maksîm Gorkî her wiha li dibistana muzîkê ya Alexander Spendyaryan bixwînim, paşê 4 salan li lîseyaya Romanos Melîkyan bixwînim, ji wir di sala 1991’ê de bikevim Konservatuara Komîtas û ji wir jî di sala 1996’an bikevim Akademiya Zanyariyê Beşê Hunerê. Min li wir 4 salan wekî aspirant berdewam kir...”

Nazê Celîl bi van gotinan dawî li vê nivîsara me ya li ser 70 saliya dayîka xwe tîne:

“Ez dîsa bêriya xebata bi dayîka xwe re dikim... Derfet û mecal hebin, ezê dîsa pê re herim xebata nav gund û zozanên kurdan!..”

Meta Cemîla Celîl,
70 saliya te Pîroz û Bimbarek be!..

EuroKurd News – Salihê Kevirbirî